Pirtûkxana Kawa
Zeradeşt û Zeradeştî
Lêkolîneke dîrokî

Nivîsîna
Remezan Şerîf Dawûdî

Pirtûka ma a vê care ji nivîsîna birêz Remezan Şerîf Dawûdî ye û rêza 57an ji weşanên Komendba Kawa bo Çanda Kurdî, digire .Çapa yekê a kitêbê bi 1000 dane li Hewlêrê derçû.
Kitêba nûser Dawûdî ji gelek beşan pêktê:
beşê yekem: Zeradeştiyên Avestayê (pirtûka Avesta-Împeratoriyeta Axmînî û pêşveçûna Zeradeştiyê-Hewildanên vejandina ola Zeradeştî).
Beşa diwemîn:Bawermendiya Zeradeştî(felsefeya Zeradeştî-kok û perensîpên ola Zeradeştî-baweriyên ola Zeradeştî-ola Zeradeştî û civak)
Paşkeoyeke dirêj û berfireh ku kitêb pê bi dawî dibe.
Dawûdî di destpêka lêkolîna xwe de Zeradeşt bi xwendevana dide nasandin û dibêje ko:"Zeradeşt kurê Porşasp kurê Midrasf ji binemala Sptman , nave dayika wî Doxd e ". derbarê kok anjî neteweya Zeradeşt de , nûser dibêje ku:"piraniya ramangîrên kurd û ên ku li ser welatê kurdan nivîsî ne dibêjin ku ew bi eslê xwe kurd bû , ji êlên Mîdiya .Her weha, Mesûdî eslê wî vedigerîne Minêcehr ê qiral , û di heman demê de eslê kurdan jî cegidgerîne Minûcehr , tiştê ku kurdbûna zeradeşt , dişesipîne".
Paşê , nûser kitêba Avesta dixe bin ronahiyê de û di vî biyavî de dibêje ku :"Avseta pirtûka Zeradeşt a pîroz e angu şeriyeta wî,dîroka nivîsandina wê ne diyar e .Zimanê Avestayê ji malbata zimanên Îranî ên bakur rojavayî ko Avesta belgeya tenha ye ji vî zimanî re .Hindek lêkolînerên pispor bi xwendinên kurdî dibîjin ku Zeradeşt kitêba xwe bi zimanê Mîdî(kurdiay Kevnare)nivîsiye, ji ber wekheviya di ware zimên de di navbera zimanê kurdî ê niha û zimanê Mîdî de .Hinekî din jî dibêjin ku zimanê Avesta herî ji zimanê Mukiryanî ko zaraveke zimanê Kurdî ye , nêzîk e ".
Nûser berdewam dike û dibêje :"Zeradeşt pirtûka xwe di serdema dewleta Mîdî (770-550 b.z)de nivîsiye.Avesta bi zêr li ser 12 hezar şermên şêlekan hatiye kolan û neqişkirin .Di serdema Sasaniyan de , bi zimanê Fehlewî şîroveyeke ji Avetsayê re bi navê Zend,angu şîrovekirina şeriyeê , hate nivîsîn".
Lêkoler di derbarê Avestayê de dide zanîn ku ji van beşan ew têt hev :
1-Yasna = angu perestkirina Yezdan û xwequrbanîkirina jib o wî .Yasna kilîta nivîsên dawî ên Avestayê ye .ji 72 beşan tê hev û gelek sirûdên ayînî dihewîne weke Home yast,Gat,Yama haptahati.
2-Vispart: pesindana Yezdan, siloganên girêdayî Yasna ne, lê beşeke serbixwe ye.
3-Vendidad= zagona li dijî pelîdan, ji gelek vegotin û gotarên girêdayî Yasnayê tête hev.Beyannameya perestî û zagonên pakkirin ê sizadana gunehiyan e.
4- Yasht=sirûdên pesindana firişteyên berpirsê her rojekê ji rojên sale ne .
5-Hortak Avesta = anjî Avestaya piçûk .Kevintirîn beşên Avestayê ye .Rêçikên limêjkirin û rojîgirtin yên rojên mehê(siroacak û Afrinacanan).
6-Xurdeya Avestayê: şîrovekirina zagon û dewran û têkiliyyên civakî ye .

Beşê diwem: Bawermendiyya Zeradeştî

Zeradeşt kûr û dûr di jiyana mirovan de diramiya bi mebesta dîtina oleke nû ku li gor jiyana wan be û pêwîstiyên wan cî be cî bike .Nakokiiya di navbera xêr û şerê de, herî bala wî kişand .Wî , ev nakokî li her cih û warî didît, nexasime di ola milieltê Mîdî û bawerî û xwedayên wan yên kevnrae de .Zeradeşt bi perestkirina yek xwedayî-Ahoremezda –bangkir.Li gor Zeradeşt , Ahoremezda afirînerê gerdûn e , ne hatiye zayîn û kes jê çê nebûye , ew sermedî ye , li her cihî ye , bi çavan naye dîtin lê tê têghiştin.
Felsefyea Zeradeştî:
Felsefeya Zeradeştî li ser ramana hebûna xûr û şerê û nakokiya berdewam û bêdawî di navbera wan de, avakirî ye .Ahormezda xwedayê xêrê ye û sembola şer jî Ahrîmen angu Pelîd e .Di dawiya vê nakokiyê de, xêr bi ser dikeve û şer têk diçe.
Perensîpên ola zeradeştrî
1-Fohomt: ramana qenc.
2- Foxot:gotina xweş.
3-Fohrşt: karên baş û sinciyên rind.
4- Neveşartina miriyan anjî şewsitandina wan û şuştina wan jib o parastina hersê elementên pşroz:av-ax-agir.
Rêbazên ola Zeradeştî
1-baweriya bi roja axirteê
2-agir di ola zeradeşrî de ji gelek beşan hevbend e: agirên sûdwerger-agirê jiyan û vejandinê-agirê tav û birûskan –agirê pizotê: ku li pêşiya

Ahoremezda di buhştê de têtе pêşkêşkirin-agirê Zeradeştî ê pşroz .
3-guhdana bi çandiniyê
4-nêrîna ji miriyan
5-firişte di ola zeradeştî de, yên xêrê ev in: Naşawhîşta-Moxiştra-Fohominah-Hortat-Amirnat-Armîtî.Yên şer ev in: Akmine-Ayinder-Sarwa-Nawtik-Heyta-Tarûmatî-Zirîce.
Hindek aspektên ola Zeradeştî :
Zeradeşt kuştin, vexwarina meyê,derwerkirin,zîna û dizî li xelkê qedexe dike .
Cejnên zeradeştî :
Cejna Newrozê
Cejna Mîhreacnê
Cejna Sidiq
Cejna Ram
Cejna Tîrekan û Firordican
Cejna Agir
Yezdan anjî Xwedayên ku di ola zeradeştî de hene:
1-Xorşîd yezd: jiyana û xweşhaliyê peyde dike mina dewlemdnî, sermedî,pak hespê çalak tê bi navkirinê.
2-yezdanê heyvê
3-yezdanê baranê
4-koş yezd
5-mîhr yezd
6-yezd Azer
7-sirûş yezd
8-rashnyazd = Rashnau
9- yezd Behram = vetethraghan.
Wateya hin bêjeyên di pirtûkê de hatî:
Ola Bîhî= Ven ola başiyê. Navê naskirî yê ola zeradeştî ye.
Înza = baweriyeke taybet di ol û mezhebê de.
Endîşe = bawerî-raman
Anyran=nave firişteyên nihandinê li nik Zeradeştiyan.
Ahrîmen=rêberê pîsîtiyê .Pelîd, sembola alozî û şerê ye.
Badir=dareke bi ber e, jina avis.
Bundahish= afirandin.Destpêka afirandina jiyanê.yek ji beşên serdema Sasanî bi zimanê Pehlewî ye şîrove dike çawaniya afirandina jiyanê li gor baweriyên zeradeştiyan.
Peyje=nêrdewaneke di navbera buhişt û dojehê de.
Bex = Xweda –yezdan-berî peydebûna zeradeştekan navê yekî ji pûtên gelê Arî.
- Beselan=roja vejandina hemî miriyan, jiyana maddî li ser zemînê, roja axiretê.
-Xudan= Xweda, afirînerê giş giyanweran.
-Dualisme (bi ferensî), Doganak bi gor zimanê Avesta .Baweriya bi nakokiya di navbera du elemantan de .Ahoremezda yê ku Zeradeştî pê bawer dikin wekû belavkerê xêr û qenciyê,li dijî Ahrîmen belavkerê şerê di jiyanê de .
Doctrine = bawerî
Dev= afirînerekî zor mezin e .bi hêz e tirsnak û bi qiloçên metrsîdar e, ji mirovan bihêztir e, alîkerê Ahrîmen e, şer û pîsîtî û sitemkarî belav dike.
Duxsar = dozex, dojeh ciyê gunehkaran.
Donadon = deketina giyan ji laş piştî mirinê,û bicîbûna wî di laşekê din de angu "veguhastin" a giyanan.-
-zayîner= afirîner
Spitamon=navê zaniyariyê Zeradeşt, ji Spitame angu kal, hatine wergirtin.
Êl = komeke ji kesan jiyana civakî bi hev re diborînin, û vedigerin heman kokê.
Kenîze (kanecak) = keç-keça piçûk.
Casan= kevintirîn û pîroztirîn beş e ji sirûdên Zeradeşt û şagirtên wî yên zîrek , ji 17 kitêbokan hevbend e .
Garrotman= text, textê xwedayî, textê qiral.
Mak=sihirbazî,cadûgerî.
Mox,mok = mirovê giyanperest, olperestê zeradeştî
Mîzed = txlîteke taybet e ji xwarinê di ahengên olî ên taybet de tê pêkêşkirin.
Metal= hasin
Mitra= roj,xwedayek bû beriya Zeradeşt.
Yasht=perestî,bilêvkirin, limêjkirin
Yekta = yekperestî, bêhempabûn.

-Dawî-